Hesta neteweyî Kurdî di başûr rojavayê Kurdistanê de

Nalîn Qenber
13/2/2007

Di destpêkê de, sipasiya Kombenda Kawa bo Çanda Kurdî dikim bo amadekirina vê heleqeya ku siyasetmedar û rewşenbîr û kesayetiyên Kurd ji her çar parçeyên Kurdistanê têde beşdarbûn, em guhdarvanan jî sipas dikin û mijara heleqê mijareke zor giring e, angu pirsa hizra neteweyî Kurdî.Belê, diyar e ko ev mijar di cih de ye ji ber ku asta ku hizra neteweyî Kurdî li her çar parçeyên Kurdistanê gihiştiyê de dide nîşandan û dibe sedemê danîna şêwe û programekî xabetê yê nû ku li gor qonaxa nuh be.

Berî ez derbasî mijara xwe ya sereke angu başûr rojavayê Kurdistanê bibim, dixawzim hinekî behsa rewşa ku em têde bikim.Kurd û xebata neteweyî Kurdî di hemû qonaxan de, weke roja îro bipêş neketiye..serkeftî nebûye.Di dema niha de, neteweya Kurd berbi armancên xwe ve diçe.Lê, her wisa divê li hemû parçeyên Kurdistanê asta tevgera Kurdî bigihe qonaxên baştir û nêzîkî dewletbûyînê bibe.Diyar e ko ev armanca hemî neteweyan bûye.Pêwîst e hemî kesên berpirsiyar û eleqedar in vê xebata neteweyî berdewam bikin.

Serkeftinên milletê Kurd li Başûr ji hemî Kurdan re serkeftin û pêkanîneke giring e û xebata neteweyî li her sê parçeyên dinê jî bihêz dike.Lê, mixabin, di pirsa neteweyî de, pêwîst e qala xaleke giring bikin.Çawa Kurdistan dabeş bûye, bûye çar parçe, pê re ruhê me yê neteweyî jî parçe bûye!.Di encamê de, her parçe bi xwe daketiye û hay ji parçeyên dinê nemaye .Eger em hestekî neteweyî giştî li ser asta Kurdistanê ava bikin, hingê em dikarin bibêjin ku hizrê neteweyî Kurdî bipêşkeftî ye û bîrewerî û zaniyariya neteweyî di asteke baş de ye.Pêwîst e ev pêkwere heta ku armancên milletê Kurd bicih bibin.Mijara dinê jî tevî ku li başûr hin serkeftin hatine bidestxistin jî, lê divê jibîr neçe ku li parçeyên din hêjî xeter ser milletê Kurd berdewam e.Gerek e em wan xeterane binasin û wan çare bikin.Di bîr û baweriya me de, yek ji wan çare anjî tedbîrane li hember xetereyên heyî xurtkirina beşên dinê Kurdistanê ye.Gelek xeter hene weke şovonîzim û despotîzmê û inkar û here bêtir terora ku gelê Kurd armanc digire.Helbet, berê pirseke wiha nîn bû, ji ber ku eniya ku Kurdan têde xebat dikir anjî rêya xebata wan ne diyar bû.Niha, herkes dizane ku milletê Kurd di kîjan rêçê de xebata xwe didomîne, ji ber vê çendê ku bûye armanca terorê.Pêwîst e ku neteweya Kurd li hember terorê şiyar be.

Di bîr û baweriya me de, ku neteweya Kurd ji bo ku ruhekî giştî ava bike pêwîst e bi avakirina heyetekê anjî xebateke weke–lobî-yan meclîseke ku temsîla civaka Kurdistanê bi giştî bike, çi saziyên civaka sivîl dibin anjî rêxistinên siyasî û ragihandin û dipolmatîk siyaseta xwe ya xurt hebin û bibandor bin. Wê katê em

dikarin bêjin ku hizra me ya neteweyî temsîla Kurd û kurdistanê bi gîştî dike.

Hesta neteweyî Kurdî di başûr rojavayê Kurdistanê de

Başûr rojavayê Kurdistanê bandor anjî rewşeka xwe ya taybet ser beşên dinê Kurdistanê heye, ew rewş di çi de dixuye?xebata neteweyî li wir çawa birê dikeve?Rewşa rojava ya teybet ji ber ku beşekî li ser şerîtekî hidûdî ji Iskenderon heya ava Dicle dirêj dike, û bi hertiştê ku li beşên din diqewime bibandor dibe, û di her xebeteke Kurdistanî yê ku li çar parçeyên Kurdistanê destpê dike, bi rengekî yekser tesîra xwe li ser wir dike û pêre tefa`ul dibe anjî, angu rojava bibandor dibe û beşdar dibe û bi hemî şiyanên xwe yên maddî û manewî li gel hêzên Kurdistanê yên ku derdiçin, xebatê dike.Di başûrê rojava de, hizr û hesta neteweyî di asteke berz û bilind de ye.Herdem Kurdên rojava xwe dûrî kêşe û pirsgirêkên Kurdistanê yên gîştî ne kirine.Berevajî vê çendê, ew gelek caran pirsên hundirîn kirine qurbanê pirsên Kurdistanê yên gîştî.Li başûr rojavayê Kurdistanê, xebata siyasî tê meşandinê, di riya rêxistin û saziyên sivîl û jin berew pêşve diçe.Rola başûr rojava di tevgera neteweyî Kurdî de herdem berz bûye lê mixabin ku li hember hestê neteweyî li rojava wekî ku tê xwestin tiştek nîn e, çimkî her tiştekî li wir biqewime kêm caran reakisyoneke Kurdistanî çê dibe.Lê heye ku ev di qonaxeke li pêş de dirust bibe wexta ku dewleta Kurdistanê ava bibe mumkin e pêkwere, lê heya anuha ku hêjî kêşeya neteweya Kurd li Sûriyê çareser nebûye, ev tişt zehemet e.

Berzbûna ruhê neteweyî di başûr rojavayê Kurdistanê de, ji komela Xoybûnê destpêkir, peyre partiya Demoqrata Kurd li Sûriyê avabû, piştre ji ber inkar û tepeseriya dewleta Sûriyê re di dawiya salên 50an de, ew parçebûnên ku di nav tevgera Kurd li Sûriyê avabûn, kêşe û kirîzeke siyasî bi xwe re anî holê.Ew inkar û tepeseriya ku li ser neteweya Kurd li Sûriyê hate avakirin û dewleta Sûriyê her bi tundî û wehşiyet nêzîkî gelê Kurd li Sûriyê bûye.Herçend ku hijmara Kurdan li wir kêm e lê ji bilî sitemkarî û inkar û despotîzmê ji rêjîmê nabînin.zor tiştên berz di dîrok û berxwedana gelê Kurd li başûrê rojava de qewimîne weke şewata sînemeya Amûdê di sala 1960î de, dema ku di encama şewatê de bêtir ji 250 zarokên Kurd hatine şewitandin, peyre di meşên Newrozê li Sûriyê di sala 1986an de, di ahengên Newrozê li Şam û Helebê gihştin astekî ku tirseke mezin xiste nav jîngehên deselatdar de.Di gel berzbûna hesta neteweyî di Newroz û boneyên neteweyî Kurdî de, siyasetmedarên Kurd jî dikevin ber zordariya rêjîma sûrî de.

Başûr rojavayê Kurdistanê tevî zor û zordariya rêjîma despotîk beramber her şoreşeke Kurdistanê beşdar û aktîv bû.Nimûne dema ku şoreşa Îlonê vêket, Kurdên rojava bi aktîvane beşdarî di şoreşa navhatî de kirin her weha piştgiriya şoreşa bakurê kurdistanê jî kir, weke tê zanîn şoreşa ku li bakur çêbû, geşbûna wê û domandina wê ya bi salan û heya niha jî jiyan dike ew hemû bi imkaniyet û derfetên başûr rojavayê kurdistanê bû lê mixabin bermaber vê kedê tiştê pêwîst nayê kirin.

Xala dawî ku dixwazim li ser rawestim derbarê hesta neteweyî Kurdî , qonaxa dawiyê de 12ê Avdara 2004an, angu serhildana Qamişlo ya here giring ku heta anuha verêja wê heye û şopa wê di mêjûya gelê Kurd li başûr rojava de her bimîne.Wê çaxê guherînên ku di herêma Kurdistanê de rûdidan û di tevahiya navçeyê de, û sembolên dîktator di

rojhilata navîn de dihate rûxandin, dengê Kurd li başûrê rojava derket.Giringiya serhildana Qamişlo ji ber ku roleke dîrokî di guherînê de li beşê rojava û tevgera wî ya siyasî de di gotara siyasiya Kurdî di wî beşî de û derketina ramanên nuh û xebateke nûjen bi hişmendiyeke hemdem.Dixwazim li vir qala hin kitekitên din yên rûdana 12ê Avdarê bikim, di kokê de, şerê ku pêkhat ji ber dijûnkirina sembolên Kurdan û berznirxandina Sedam Husên di yarîgeha Qamişloyê de destpêkirin.Diyar e ko di dîrokê de, tê zanîn ku şerê cîhanê ê yekê ji ber sedem in wisa destpêkir, ji ber wisa bûyerên Qamişlo dîrokî û zor giring in.Her weha, êrîşên 11 Îlonê li NewYorkê bûne destpêka şerê li dijî terorê di tevahiya cîhanê de.Bûyer di nêrîna min de nîşana destpêkirina guherînê di rojhilata navîn de bûn û verêja wan dê berdewam bikin.Weke nimûne konferansê ku li Broksel û Waşînton û Parîsê hatine girêdan hemî ji encamên Avdarê bûn, û guherîn dê her bipêş bikeve.Her weha, di dawî de, dibêjim ku divê em xwedî li wan bûyeran derbikevin û guherînê di nava xwe de pêkbînin û... sipas!